

FOLKLOR Û ZIMAN

Kovara Akademîk û Navneteweyî ya Xebatên Kurdî

International Academic Journal of Kurdish Studies

Cild/Volume:1 Hejmar/Issue:2

Çirîya Pêşîn 2020



Weqfa Mezopotamyayê

Folklor û Ziman

Cild: 1

Hejmar: 2

Sal: Çirîya Pêşîn 2020

Xwedî: Li ser navê Weqfa Mezopotamyayê Selim Ölçer

Berpirsa Nivîsan: Gevriye Atlî

Edîtor: Mustafa Aslan, Mikail Bûlbûl

Redaksîyona kurmançî: Mikail Bûlbûl

Redaksîyona kirmanckî: M. Malmîsanij

ISSN: 2667-6435

Mîzanpaj: A Grafik

Berg: Hasan Asan

Navnîşan: Mezopotamya Eđitim Bilim Sanat Sađlık ve Kùltùr Vakfî

Urfa Yolu Üzeri, Çeysa Serhat Plaza. A Blok Kat:11 No:29

Çapxane: Aliođlu Matbaacılık Bas. Yay. Ve Kađıt Sa. Tic. Ltd. Őti.

Orta Mah. Fatin RùŐtù Sk. No: 1-3/A BayrampaŐa-İstanbul

Numraya Sertîffikayê: 11946

Edîtor

Doç. dr Mustafa Aslan (Zanîngeha Mardin Artukluyê -Tirkîye)

Dr Mikail Bûlbûl (Weqfa Mezopotamyayê - Tirkîye)

Lijneya Edîtorîyê

Prof. dr Celilê Celil (Institut fùr Kurdologie - Awisturya)

Dr Mehmet Tayfun/M. Malmîsanij (Zanîngeha Mardin Artukluyê -Tirkîye)

Dr Hemin Omar Ahmad (Zanîngeha Soranê - Kurdistan/ Îraq)

Dr Necat Keskin (Zanîngeha Mardin Artukluyê - Tirkîye)

Dr Ramazan Pertev (Zanîngeha Rouen Normandîeyê - Fransa)

Lijneya Şêwirmendîyê

Prof. dr Ebdulwehab Xalid Musa (Zanîngeha Newrozê - Kurdistan/ Îraq)

Prof. dr Kadri Yıldırım (Zanîngeha Mardin Artukluyê -Tirkîye)

Prof. dr Sabah Reşîd Qadir (Zanîngeha Raperînê - Kurdistan/ Îraq)

Prof. dr Farûk İsmâîl (Frei Universitât Berlin - Almanya)

Prof. dr Şukriye Resûl İbrahîm (Zanîngeha Tîşkê - Kurdistan/ Îraq)

Prof. dr Tahirhan Aydın (Zanîngeha Mardin Artukluyê - Tirkîye)

Prof. dr Bahîz Omar Ahmed (Zanîngeha Duhokê - Kurdistan/ Îraq)

Doç. dr Bextiyar Secadî (Zanîngeha Kurdistanê - İran)

Doç. dr Mehmet Zahir Ertekin (Zanîngeha Bîngolê - Tirkîye)

Doç. dr Mustafa Öztürk (Zanîngeha Mardin Artukluyê - Tirkîye)

Dr Shahab Valî (Zanîngeha Mardin Artukluyê - Tirkîye)

Dr Süleyman Şanlı (Zanîngeha Mardin Artukluyê - Tirkîye)

Dr Canser Kardaş (Zanîngeha Mûşê - Tirkîye)

Dr Abdurrahim Özmen (Zanîngeha Dicleyê -Tirkîye)

Hekemên Vê Hejmarê

Prof. dr Farouk Ismail

Prof. dr Tahirhan Aydın

Doç. dr Mustafa Aslan

Doç. dr Nesim Sönmez

Dr Ahmet Kırkan

Dr Hemin Omar Ahmad

Dr İbrahim Bingöl

Dr Kenan Subaşı

Dr Mikail Bülbül

Dr Necat Keskin

Dr Nurettin Beltekin

Dr Ramazan Pertev

Dr Zülküf Ergün

NAVEROK

Gotar

Tesewirên Nasnameyî yên Kurdên Elewî û Êzîdî di Pêwendîya Vegotinên Gelêrî da

Hikmettin Atlî - Canser Kardaş

Hevreferansîya Bikeran di Hevokên Aloz da

Sinan Gültekin

Hêmayên Homoseksuel û Karakterên Queer di Destana Memê Alanî da

Aram Roder

Destpêkêk Derheqê Kokê Ziwani de

Veysel Yıldızhan

Nav û Cureyên Sewalan (Ajelan) û Çanda Sewalvanîyê li Devera Qerejdaxa Wêranşarê

Ferhat Kaplan

Berawirdeka Dengnasî di Navbera Kurmancîya Xorasanê û Kurmancîya Bakurî da

Mehdi Jafarzadeh

Xuyang û Forma Rêzimanî ya Rewşan di Kurmancîyê da

Ümran Altunkılıç

Rêzbûna Dîyarkerên Piştî Sereyî di Girêya Navî ya Govera Behdînî ya Zimanê Kurdî da

Bahiez Omar Ahmed

Metin – Analîz

Nirxandina Destxeta Mela Mehmûdê Bazîdî “Kêşana Lêkerên Kurdî”

Mikail Bülbül-Mustafa Öztürk

Nasandina Pirtûkan

Munzur Çem, *Veng Ê Hesreta Herdê Dewrêşî*

Ugur Sermîyan

Necat Keskin, *Folklor û Edebîyata Gelêrî*

Mustafa Aslan

Ji Edîtoran

Em kêfxweş in ku bi hejmara xwe ya duyem ya kovara Folklor û Zimanê li pêşberî we ne. Folklor û Ziman ku di bin banê Weqfa Mezopotamyayê da, salê du caran (nîsan û çirîya pêşîn) derdikeve û kovareka bihekem û navneteweyî ye. Di kovarê da xebatên akademîk yê li ser folklor û zimanê kurdî cih digirin. Zimanê gotaran, ji bilî kurteyên îngilîzî, bi temamî kurdî ye.

Di çerçoveya folkora kurdî da mijarên wekî teorîyên folklorê, edebîyata gelêrî, adet û tore, bîr û bawerîyên gelêrî, zanyarîyên gelêrî, ferhenga herêmî, têgehên folklorê kurdî, xebatên meydanî û herweha lêkolîn û nivîsên derbarê etnografyaya kurdî da û hwd dihên weşandin. Di çerçoveya xebatên zimanî da jî dê her cure mijarên têkildarî fonolojî, morfolojî, sentaks, morfosentaks, zimannasîya civakî (sosyo-lingûîstîk), zimanzanîya îranî hwd cih

bigirin. Di kovarê da dê nivîsên di forma gotar, werger, danasîna sempozyum, pirtûk û tezan da jî biweşin.

Em hêvî dikin ku Folklor û Ziman bibe yek ji çavkanîyên akademîk û zanistî û alîkarîya lêkoleran bike. Bi taybetî piştî ku di van salên dawî da li çend zanîngehan beşên kurdî yê lîsansê û masterê vebûn, hem geşebûneka xurt ya asteka akademîk çêbû hem jî bi qasî wê pêwîstî bi xebatên bi vî rengî zêdetir bû. Loma jî ji bo xebateka bi vî rengî motîvasyonek peyda bû û niha em bi hejmara duyem li pêşberî we ne.

Di vê hejmara me ya duyem da neh gotarên zanistî yê li ser folklor û zimanê kurdî hene. Em dikarin bi kurtî wan weha vebêjin:

Akademîsyen Hikmettin Atli û Canser Kardaş di gotara xwe ya bi navê “*Tesewirên Nasnameyî yê Kurdên Elewî û Êzîdî di Pêwendîya Vegotinên Gelêrî da*” bi berfirehî li ser têgihîştina kurdên elewî û êzîdî ya nasnameyî sekinîne û bi rêya rengvedanên wê yekê yê di vegotinên gelêrî da analîz kirine.

Sinan Gultekin di çerçoveya rêzimana nûjen da, gotara xwe ya bi navê “*Hevreferansîya Bikeran di Hevokên Aloz da*” pêşkêş kirîye ku bi berfirehî û bi datayên çendîni, li ser stratejîyên jêçûn û jêbirina bikerên hevreferans sekinîye.

Lêkoler Aram Roder di çerçoveya xebatên folklorê da, di gotara xwe da ku bi navê “*Hêmayên Homoseksuel û Karakterên Queer di Destana Memê Alanî da*” ye, li ser destana Memê Alanî sekinîye û di çerçoveya teorîya Queerê da û bi bingeheka teorîk ya xurt û xwendinên hêja, analîzên balkêş li ser karakterên vê destanê kirine.

Veysel Yildizhan di gotara xwe da ku bi navê “*Destpêkêk Derheqê Kokê Ziwanî de*” ye û bi dîyalekta kirmanckî nivîsîye, li ser perspektîfên peydabûna zimanî sekinîye û bi îstîfadekirina ji gelek xebatên teorîk tabloyeka giştî pêşkêş kirîye.

Lêkoler Ferhat Kaplan di gotara xwe da ku bi navê “*Nav û Cureyên Sewalan (Ajelan) û Çanda Sewalvanîyê li Devera Qerejdaxa Wêranşarê*” ye û encama xebateka meydani ye, hem li ser çanda sewalvanîyê hem jî li ser termên wê çandê xebateka hêja kirîye.

Mehdi Jafarzadeh lêkorekî bi eslê xwe ji herêma Xoresanê ye, di gotara xwe da ku bi navê “*Berawirdeka Dengnasî di Navbera Kurmancîya Xorasanê û Kurmancîya Bakurî da*” ye, li ser berawirdkirina fonolojîk ya kurmancîya Xoresanê û ya standard (bakurî) sekinîye û taybetî li ser guherîna dengdêr û dengnedêran gelek nimûne pêşkêş kirine.

Akademîsyen Umran Altinkiliç di gotara xwe da ku bi navê “*Xuyang û Forma Rêzimanî ya Rewşan di Kurmancîyê da*” ye li ser xuyanga rêzimanî ya cureyên lêkeran sekinîye û bi gelek mînakên rewşa wan semantîk nîqaş kiriye.

Bahiez Omar Ahmed jî di gotara xwe da ku bi navê “*Rêzbûna Dîyarkerên Piştî Sereyî di Girêya Navî ya Govera Behdînî ya Zimanê Kurdî da*” ye li ser modîfîyekerên paşnavdêrî û rêzbûna wan sekinîye û li gor devoka behdînî ew analîz kirine.

Akademîsyen Mikail Bulbul û Mustafa Ozturk di gotara xwe da ku bi navê “*Nirxandina Destxeta Mela Mehmûdê Bazîdî Kêşana Lêkerên Kurdî*” ye, li ser destxeta Mela Mehmûdê Bazîdî ya 1866an sekinîne û hem zimanê Bazîdî hem jî naveroka berhema wî analîz kirine.

Di beşa nasandina pirtûkan da jî du pirtûkên hêja hene. Yek jê ya Munzur Çemî (*Veng û Hesreta Herdê Dewrêşî*) ye ku bi kurdîya kirmanckî hatîye nivîsîn û Ugur Sermîyan nasandina wê kirîye. Ya din jî ya akademîsyen Necat Keskin e ku bi navê “*Folklor û Edebîyata Gelêrî*” ye û Mustafa Aslan nasandina wê kirîye.

Edîtor

Mustafa Aslan, Mikail Bülbül

Atlı, H. & Kardaş, C. (2020). Tesewirên nasnameyî yên kurdên elewî û êzîdî di pêwendîya vegotinên gelêrî da. *Folklor û Ziman*, 1(2), 35-60.

Wergirtin/Received: 2020-05-02

Qebûlkirin/accepted: 2020-08-26

ORCID (Atlı, H.): 0000-0002-0868-3294

ORCID (Kardaş, C.): 0000-0001-8557-8706

TESEWIRÊN NASNAMEYÎ YÊN KURDÊN ELEWÎ Û ÊZÎDÎ DI PÊWENDÎYA VEGOTINÊN GELÊRÎ DA

Hikmettin ATLI1-Canser Kardaş2

Kurte

Di avabûna nasnameya kolektîf da, li kêleka çend dîyardeyên giring, dîn û bawerî hêmanên gelekî xurt in ku carinan, di hin periyodên dîrokê da, rê lê vedikin ku civak xwe li ser bingeha wan pênasê bikin. Di nava civaka kurd da jî, digel nîqaşên giştî li ser nasnameya kurdbûnê, hin civakên etno-dînî hene ku, pênaseyên wan yên nasnameyî yên derbarê xwe da, hem nîqaşa li ser nasnameya kurdî kûrtir dikin û hem jî nîqaşa li ser nasnameya

1 Dr, lêkolerê serbixwe, Dîyarbekir. E-mail:bedranh@gmail.com

2 Doç. Dr Zanîngeha Mûşê, Beşa Ziman û Edebîyata Tirkî. Mûş. E-mail:kardascanser@gmail.com

wan bi xwe jî derdixe meydanê. Dema ku em seyra dîrokî ya van nîqaşan datînin pêş xwe, tê dîtîna ku ev nîqaş hem di asta civakê da û hem jî di asta lêkolera da, tu car bi temamî li dû prensîbên zanistî bi rê ve neçûye. Di vê kontekstê da civakên elewî û êzîdî yên kurd, ji aliyê şênberîya vê nîqaşê ve, du mînakên gelekî giring in. Wekî îlaweyekê li vê nîqaşê, em ê berê xwe bidin metînan folklorî ku li wê derê ji tesbîtan derveyî bêtir, tesewirên civakî derdikevin pêşberî me ku ev yek meyla civakê ya objektîf dide der.

Peyvên Sereke: Folklor, kurd, elewî, êzîdî, etnîsîte, etno-dîn

IDENTITY PERCEPTIONS OF ALEVI AND EZIDI KURDS IN THE CONTEXT OF FOLK NARRATIVES

Abstract

Religion and beliefs are crucial elements in the construction of the collective identity and in some periods of history communities take them as basis to define themselves. Although there are general debates on Kurdish identity within the Kurdish society, the existence of some ethno-religious groups and their self-definition deepens the debate on Kurdish identity in general and reveals the debate on their identity perceptions. When we look at the historical course of these discussions, it seems that this issue has never been carried out entirely in the light of scientific criteria, both on the social level and on the level of researchers' definitions. In this context, the Kurdish Alevi community and the Yazidi communities are two important examples of the concreteness of this debate. As an additional contribution to this debate, we will regard a look into folklore texts, where the concept of the society appears before us, and this shows the objective tendencies of that social group.

Keywords: Folklore, kurd, alevi, ezidi, ethnicity, ethno-religion

Destpêk

Di qada zanistên civakî da nasname ji gelek alîyan ve hatîye analîzkirin. Lewra mirovek yan jî civakek di heman demê da dikare xwediyê gelek nasnameyan be. Çawa ku silsîleya nijadî dibe sedem ku zanavek li me bê kirin wisa jî bawerîya me yan jî baweriyên me dibin zanavek kategorîk li ser me. Çawa ku zayenda ku em pê hatine dinyayê dibe navek li ser me wisa jî statûya me ya civakî yan jî çînî dibe nasnameyek ji bo me. Çawa ku zimanê em pê diaxivin me wekî kategorîyek cuda pê nase dike wisa jî erdnîgarîya ku em li serê hatine dinyayê dibe hêmaneka bingehîn ya nasnameya me. Ev hêmanên ku di kesekî da dibin sedema dîyarkirina zanavî di heman demê da ji bo civakekê jî tîna heman maneyê.

Ev hêmanên ku em dikarin wekî tebeqe yan jî kategoriyên cuda pê nase bikin, carinan hemû bi hev ra digihîjin hev û nasnameyeka neteweyî ya hevpar pêktînin û carinan jî kategorîyek yan jî hin kategorî li gorî yêna din bêtir derdikevin pêş û dibin sedema derçûna nasnameyên cuda. Wekî mînak kesek dikare nasnameya xwe ya zayendî derxe pêş û jinbûn yan jî mêrbûna xwe wekî nasnameyeka herî berfireh li ser hemû kategoriyên din bibîne û xwe li dû zayenda xwe pê nase bike. Herweha kesek dikare heman miameleyê bi pevgirêdanên